

## Isma'il Omer Çirahilgirê têgehên nûjen

Diyar Ehmed

Dema mirovekî Kurd yê têkoşer û xebatkar ber bi dilovaniya xwedê ve diçe, gelek gotar û nivîser li ser jîn û jiyana wî kesî têne weşandin, lê mixabin tevaya wan nivîsaran di warê jimartina qenciyan û vedana pesnan de dimînin.

Ji ber tivavekî ew alî hatiye têrkirin, pir nivîs û babet li ser hatine belavkirin. Emê hewil bidin ku hinekî xwe dûrî wî warî bikin û tenê derbas bibin di naverasta daxuyanîkirina nêrîn û ramanên wî mirovî civakêş û cangorî de. Ew kesê navdar ne li hêviya wê ma ye, ku mirov pesnê wî bide yan jî li ser wî bigirî û reşê li ser girê de, dawiyê dana pesnan, jimartina başî û qenciyan weke şabaşên mitirbane, bi betalkirina dawetê re, ew şabaşî dimînin di şûn de û li cihê dawetê diqurmiçin, û têne jibîrkirin.

Vêca Pirs ew e, eger em tenê pesnê wî kesê bîrbir, rewşenbîr, zîrek û çeleng bidin, qencî û başiyên wî diyar bikin, emê çi li jiyana wî zêde bikin...?. wek ku bav û kalên me di zargotina xwe ya şêrîn de gotine: ( girî û reşgirêdana li ser miriyan weke qêrîn û hawara li dûv gura ye ). Ji ber vê yekê jî em dizanin ku em nikarin xwe û xwe negrin. Emê li şûna delal û xoşewîstên xwe hêstiran bibarînin, rondika birijînin, tenûra derd û kulan sar bikin û bilorînin. Nexasim di demeka wisa tenik û hestiyar de, ku meydana kar û xebatê ji xebatkar û cangoriyan re maye vala, jimara kurdperwer û berevanên kêşa kurdî di kêmê de ye, kaniya dana merd û qehremanan îro ziwa bûye. Emê bikin hawar û qêrîn, hevсарê hêstir û rondikan berdin ku di ser dêman de bi gindirîn, tevî ku em dizanin wê serkaniya wan hêstir û rondikan biçike. Lê tevî wan jî tiştê giring û pêtvî ew e, ku mirov tucarî şûn û şopa

wan têkoşer û xebatgêran bernede, bîr û ramanên

wan ronî bike, li dû daxwaz û xwestekên wan venegere, doz û kêşa wan dayî li ser milên xwe ne deyinê, ta nêrê sedestî, sitem û zordariyê li ser sînga miletê me rabe û milet bi serbestî li ser xaka bav û kalan bi azadî û wekhevîyê şabibe. Hîngê di baweriya me de wê cangorî û cefakêşên miletê me serê xwe bi nazî deyinê û bêhin fereh herin gorê.

Emê di van çend rêzan de, li ser hin çirîskên geş di quncikên tarî de vêketine, û li ber bayê peyîzê serê wan çirîskan miçûbel dibin, li ber çirîskên çiraya yekî ji wan mirovên merd û cansivik rawestin, tevî ku me berî niha jî da xuyanîkirin ku pir gotar û nivîser li ser wê rewşê hatin weşandin. Lê, emê hinekî xwe berdin di nava keliş û kevanên bîr û boçûnên mamoste Isma'il Omer serokê Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê (Yekîtiya) de û hin ji raman û nêrînen wî yên balkêş diyar bikin, û hin dîtir ji destxet û helwêstên wî yên mafadar bidin xuyakirin, riya wî girtî bikelêjin, wan têgehên hûr û kûr vedin û hilkewêşin û wan li ber ronahiya çirahilgirê wê vewejêrin, ji seqemê biparêzin.

Mamoste Isma'il Omer rêkelêjê peyv û gotinên nazik û ciwan bû, çirahilgirê têgehên ravekêş û nûjen bû, yek ji serkird û xebatkarên pêşeng di nav rêzên Tevergera Kurdî li rojavayê Kurdistanê de bû û cihekî wî yê taybet û xuya hebû. Çima ev cihê berz girtibû û ew baweriya mezin di civaka kurdî de pê hatibû kirin, û cihê bilind û xuya di dil û canê dost û hevalên xwe de jî çêkiribû...?

Bi rastî wek min mamoste Isma'il Omer ji nêzîk ve nasdikir, û wek ji nivîsar û ramanên wî jî tê xuyakirin, ewî ev cihê berz û bilind, baweriya kûr li rex hejêker û dostên xwe standibû, ne tenê **D.R.5**